Step Together Agahiya Nepenî

Nepeniya we û her agahiya ku hûn ji vê banga alîkariyê re pêşkêş dikin dê bi rêzdarî werin girtin. Hûn dikarin daxwaz bikin ku gelêrî bimînin û em bi sepandina zagonê re ne têkildar in. Wek hemû xizmetên piştîvanî heke ku em bi xeternakek li ewlehiyê agahdar bibin, em jî xwediyê erka lênihêrînê ne, lê her agahî bi qanûngeriya nepenî ya NSW we tê girtin.

Dibe ku banga alîkariya Step Together re telefon bikim û gelêrî bimînim?

Erê, hûn dikarin daxwaz bikin ku hûn gelêrî bimînin ji ber ku Step Together xizmetek piştivaniya nepenî ye. Ji bo ku hûn bikaribin ew alîkariya ku hûn pê re hewce ne hildin, pêşkêşiya hin agahiyan pêwîst e, lê ew agahiya wek agahiya şexsî tê rêz kirin û bi rêzê Bernameya Îdareya Nepenî ya Department of Communities and Justice ve bi ewlehî tê helgirtin. Bangan bi ewlehî têne tomar kirin û helgirtin û dibe ku ji bo erka lênihêrînê, kalîte û armancên perwerdehiyê werin bikar anîn. Ji bo biryarnameyên sûcên tawankar, xeternaka nêz ji bo komên kêmî anjî xeternaka nêz ji bo ewlehî, dibe ku agahdarî ji alîyên sêyemîn re were parve kirin. Em her weha mecbûr in ku tawanên giran li gorî beşa 316 ya *Crimes Act 1900* ragihînin.

Agahdariya min çi dibe?

A: Her agahdariya ku em berhev dikin tê bikar anîn ku ji bo pirsyarên we re alîkariya çêtirîn bide û ew agahdarî li gorî zagonên nepeniya NSW tê girtin. Weke xizmetek têkilbûna zû ku dixwaze agahdarî û guhaztin peyda bike, bê têkiliya sepandina zagonê hûn dikarin agahdarî û piştgirî ji Step Together`ê bigerin. Her weha hûn dikarin daxwaz bikin ku nasnameya we neyê tomar kirin. Lêbelê, heke em hay ji gefek giran ya li ser jiyan, tenduristî anjî ewlehiya we an yên din, an xeternakek gırîng a li ser komên kêmî hebin, em dê we teşvîq bikin ku hûn karûbarên acîl anjî polîs re têkilî daynin û dibe ku em xwe jî wisa bikin.

Agadarkirina Nepenî

Pratîkên nepenî yên Hikûmeta NSW di berhevkirin, hilanîn, bikar anîn û eşkerakirina agahdariya kesane û tenduristî de ji hêla *Privacy and Personal Information Protection Act 1998 (NSW)* û *Health Records and Information Privacy Act 2002 (NSW) ve* têne rêz kirin. Van zagonan xwediyê rêbazên nepenîtiyê ne ku me re dibêjin:

- çi agahdarî em dikarin berhev bikin û em dikarin çawa berhev bikin
- em çawa dikarin ew agahdariya kesane û tenduristî helbigrin û biparêzin
- hûn çawa dikarin bizanibin ku em xwediyê çi agahdarî ne û heke ew ne rast be çawa dikarin sererast bikin
- em dikarin çawa agahdariya we ya bi parastina nepenî ji bo tenduristî û agahdariya din ya hestewer bikar bînin û eşkera bikin
- di derbarê îxlal kirina nepeniya xwe hûn çawa dikarin gazinde bikin.

Dema berhevkirin û îdare kirina agahdariya kesane û tenduristî, ev agadarkirina nepenî li Department of Communities and Justice (Wezaret) û ajansê wî yên têkildar ên ku bi zagona nepeniya NSW re dişêwire. Agahdariya ku em ji we an ji aliyek sêyemîn a desthelatdarkirî berhev dikin dê ji hêla wezaretê ve were girtin û bikar anîn da ku em xizmetan pêşkêş bikin û em bikaribin berpirsiyariyên me yên zagonî bicîh bînin. Ji bo ku em awayê pêşkêşkirina xizmetan sazbikin, rêk bixin û baştir bikin, dibe ku em agahdariya we di nav wezaretê de bi tevahî bikar bînin. Her weha wezaret bi zagonî hatiye destûrdan ku hin şert û mercan de agahdariyê bide saziyên derveyî.

Agahdariya zêdetir di derbarê mafên we yên nepenî:

- Telefon: 02 9716 2662
- Têleks: 02 9377 6167
- Epeyam: privacy@facs.nsw.gov.au

Privacy Policy PDF, 191.86 KB ya Wezaretê pratîkên rêve birina agahdariya kesane û tenduristî ya Wezaretê xêz dike. Her weha ew salox dide bê ew Nezaret agahdariya kesane û tenduristî çawa birêve dibe. Rêbaza Nepenî ya Wezaretê çarçoveyek dîyar dike da ku Wezaret çawa agahdariya kesane û tenduristî birêve dibe. Em bi berpirsiyarî û bi rêkûpêk îdarekirina agahdarî û parastina nepenetiya hevparê, karker û endamên giştî da ku em berhev dikin re girêdayî ne.

Her weha Wezaret berî demekê Privacy Management Plan PDF, 302.45 KB da ku dîyar dike ka Wezaret bi çi awayî berpirsiyarên li bin *Privacy and Personal Information Protection Act 1998* û *Health Records and Information Privacy Act 2002* de pêk tine nûve kir.

Vê danezana nepenî li ser hemî rûpelên ku bi eşkerayî ya gihîştî li ser vê malperê ye re derbas dibe.

Wezaret bi rêbazên nepeniyê an pratîkên ya malperên ne Wezaretê ne re berpirsiyar nîne.

Pirsên li ser sepandina vê rêbazên nepeniyê an daxwaza gihîştina agahdariyê dive bi nivîskî were li adresa jêrîn de rêve kirin:

Open Government, Information and Privacy Unit
Department of Communities and Justice
Locked Bag 4028
Ashfield NSW 2131